# Lîsteya tehqîbkirinê ya zorbikarhanîna malbatî û li malê (Family and domestic violence checklist)

Ger derbarê ewlehiya (selametiya) xwe û malbata xwe de xemgîn î, em dikarin alîgir bin. Ev in hinek tiştên ku divêt di bala xwe de bihêlî ger peywendiyê bi Child Support, Centrelink û Medicare re deynî:

## 1. Dikarî xwe bigihînî dokumentên nasnameya şexsî (belgehên nasnameya kesayetî)?

Heye ku em dokumentên nasnameya kesayetî ya te û zaroyên te bixwazin. Ev dikarin belgehên weha bin:

- rêdana ajotinê
- belgeha jidaybûnê
- agahiyên vîzayê
- pasport.

Ger nikarî wan bi dest xî, em dîsa jî dikarin alîkariya te bikin. Peywendiyê bi me re deyne û em ê bi hev re li çareyên din bigirin.

## 2. Dizanî tu dê çiqa pere bi dest xî?

Payment and Service Finder ya me bi kar wîne da bibînî ka çiqa pere û çi xizmetan dikarî bi dest xî.

Dikarî wê her weha ji bo dîtina xizmetên li nêzikî xwe bi kar wînî. Wîlayeta/herêma xwe bibijêre, dû re zorbikarhanîna malbatî û li malê (family and domestic violence). Bo bêtir agahdarî bi Înglizî biçe vê malperê: **servicesaustralia.gov.au/paymentfinder**

## 3. Kesekî din li ser navê te bi me re têkildar be?

Em dikarin bi te re alîgir bin bo dawîdana rêkevtinekê, ger kesekî din:

- xwediyê mafê têkildariya bi Centrelink, Medicare û Child Support re be li ser navê te
- pereyên ji Centrelink bi dest dixe û bi kar dihîne.

Em ê te aghadar bikin ger divêt em aliyê din haydare guhertinê bikin.

## 4. My Health Record ya te yan ya zaroyê/zaroya te heye?

Agahiyên peywendî-girêdanê yên wek navnîşana te dikarin di My Health Record ya te yan ya zaroyê te de hebin.

Ger ev dikare te û malbata te têxe nav tehlûkeyê, telefone xeta alîkariyê ya My Health Record

**1800 723 471** bike û **option 1** Ibibijêre.

## 5. Çi pêdivêyên ku divêt tu bi cîh bîkî hebin bo bidestxistina pereyên Centrelink?

Heye ku bicîhkirina mercên beşdarîkirinê yan yên hevberpirsiyarê (participation or mutual obligation requirements) pêwîst bin bo bidestxistina pereyên Centrelink.

Bi me re yan bi pêşkêşerê alîkariya xwe re (your provider) biaxafe, ger nikarî:

- beşdare kombûnekê bibî
- mercên beşdarîkirinê yan yên hevberpirsiyariyê (participation or mutual obligation requirements) bi cîh bikî.

## 6. Te agahiyên derheqê xwe de li nik me nû kirin?

Wek beşekî ji bo tevdêrên ewlehiya xwe, agahiyên xwe yên şexsî li nik Child Support, Centrelink û Medicare nû bike. Navnîşana postayê yan jimara telefonê, bo nimûne.

Mebest ji vê yekê ew e ku tenê tu pere û nameyên em rê dikin bi dest xî.

## 7. Pêdiviya te bi guhertina peyvên nehênî (passwords) heye?

Ger kesekî din dikare xwe bigihîne malperên te yên înternêtî yan myGov, dikarî peyvên xwe yên nehênî (passwords) dema bixwazî biguherî.

Ger derheqê ewlewhiya agahiyên xwe yên tomarkirî de (your records) xemxwar bî, me agahdar bike. Bo nimûne, ger xemxwar bî kesek ketiye naveroka malpera te ya myGov, telefone xeta alîkariya myGov **132 307** bike bo alîkariya bi Înglizî**.**

## 8. Pêdiviya te bi wê yekê heye ku xwe biguherî ser karteke din ya Medicare?

Dikarî navê xwe biguherî ser karteke nû ya Medicare ger mayîna navê te li ser karta din bo te ne bi ewlehî be.

Bo guhertinê, telefone Medicare bike li ser vê jimarê **132 011** û bi Înglizî ji me re bibêje ka dixwazî çi bikî.

## 9. Hesabekî bankê li ser navê te heye ku tu bi ewlehî bi kar wînî?

Wek beşekî ji bo tevdêrên ewlehiya xwe, heye ku te hesabekî bankê yê tenê li ser navê te hebe ku dikarî bi ewlehî bi kar wînî.

Ger dixwazî em pereyên te rêbikin wî hesabê bankê, pêdiviya te bi guherandina agahiyên hesabê te yê bankê heye (yê berê). Ji bîra te neçe ku divêt vê guhertinê hem jibo Centrelink, hem jibo Medicare û hem jibo Child Support bikî.

## 10. Bo têgihîştina (fêhmkirina) agahiyên me pêdviya te bi alîkariyê hebe?

Ger jibo têgihîştina agahiyên derheqê pere û xizmetên em didin de pêdiviya te bi alîkirinê hebe, rêyên bo alîkirinê hene. Bo nimûne, em dikarin alîgir bin ger:

- kêşeyên te yên bihîstinê yan axaftinê hebin
- pêdiviya te bi wê yekê hebe ku bi zimanê xwe bi kesekî re biaxafî
- tu yan kesekî/keseke tu serpereştiya wî/wê dikî xwediyên seqetiyekê, nexweşiyekê yan ziyaneke (brînbûneke) giyanî ne.

Da ku bi zimanê xwe bi me re biaxafî telefone van jimaran bike:

- **131 202** derheqê pere û xizmetên Centrelink de
- **131 450** bo peywendiya bi xizmeta wergerê Translating and Interpreting Service (TIS National) re derheqê pere û xizmetên ji Medicare yan Child Support de.

Biçe **servicesaustralia.gov.au/accessibility** bo bêtir agahdarî bi Înglizî.

Dikareî her weha agahiyên bi zimanê xwe ji **servicesaustralia.gov.au/yourlanguage** bi dest xî.

## 11. Te nuha haleteke child support heye, yan pêdiviya te bi daxwaza child support bo Family Tax Benefit heye?

Telefone Child Support bike li ser vê jimarê **131 272** bo agahiyên bi Înglizî ger derheqê van pirsan de bi xem bî:

- daxwaza child support ji hevjînê/hevjîna xwe (partner) yê/ya berê
- peywendî-girêdana me bi hevjînê/hevjîna te (partner) yê/ya berê re.

## 12. Mijareke din heye ku dixwazî derheqê wê de bi me re biaxafî?

Dikarî bi me re biaxafî ger derheqê van mijaran de pirsên te hebin:

- Pereyên yan deynê Centrelink
- Preyên Medicare yan proseyên pê ve girêdayî
- Pîvan (teqyîmkirin) û deynên bi Child Support ve girêdayî
- Ewlehiya agahiyên tomarkirî (records) yên derheqê Child Support, Centrelink û Medicare de.

Biçe **servicesaustralia.gov.au/contactus** bo bêtir agahdarî bi Înglizî.

## 13. Dikarim ji ku xizmet û rêyên din bo alîkariyê bi dest xim?

Karmendên me yên civatî xizmeta bêpere û nepen (nehênî/confidential) bo şêwirmendiyê (counselling) pêşkêş dikin. Dikarin te rêbikin xizmetên din ku belkî bi te re alîgir bin. Telefone xeta me ya Employment Services bike li ser vê jimarê **132 850** û axaftina bi karmendekî civatî re bixwaze. Me agahdar bike ger pêdiviya te bi wergêr hebe. Em ê wergêr bêpere ji te re bibînin.

Rêxistinên din yên alîkirina te hene. Dikarî ji vir lîsteya bi Înglizî bi dest xî:
**servicesaustralia.gov.au/domesticviolence**

**1800RESPECT (1800 737 732)** xeta alîkirinê 7 rojan bo 24 sa’etan heye û dîtina xizmetan li herêma te ‘Find services in your area’ di kar de ye.

Ask Izzy rêberiyek e ku alîkariya te dike bo dîtina xizmetên li herêma te. Biçe **askizzy.org.au**

# Family and domestic violence checklist

If you are concerned about your or your family's safety, we can help. Here are some things to keep in mind if you contact Child Support, Centrelink or Medicare.

## 1. Do you have access to personal identity documents?

We may ask for personal identity documents for you and your children. This could include documents like these:

- driver licence
- birth certificate
- visa details
- passport.

If you do not have access to them, we can still help you. Contact us and we will work with you to find other options.

## 2. Do you know what payments you can get?

Use our Payment and Service Finder to see what payments and services you may be able to get.

You can also use it to find services near you. Select your state or territory, then family and domestic violence. Go to **servicesaustralia.gov.au/paymentfinder** for more information in English.

## 3. Does someone else deal with us on your behalf?

We can help you end an arrangement if someone else:

- has permission to deal with Centrelink, Medicare or Child Support on your behalf
- is getting and using your Centrelink payment.

We will let you know if we need to tell the other party about the change.

## 4. Do you or your children have a My Health Record?

Your or your child's My Health Record can contain contact information such as your address.

If this could put your family at risk, call the My Health Record Help line on **1800 723 471** and select **option 1**.

## 5. Do you have any requirements you need to meet to get your Centrelink payment?

You may need to meet participation or mutual obligation requirements to get a Centrelink payment.

Talk to us, or your provider, if you cannot:

- attend an appointment
- meet your participation or mutual obligation requirements.

## 6. Have you updated your personal details with us?

As part of your safety planning, update your personal details with Child Support, Centrelink and Medicare. This could be a new postal address or phone number.

This is to make sure only you get payments and correspondence from us.

## 7. Do you need to change any of your passwords?

If someone else has access to your online or myGov accounts, you can change your passwords at any time.

If you are concerned about the security of your records, let us know. For example, if you think someone has accessed your myGov account, call the myGov help desk on **132 307** for help in English**.**

## 8. Do you need to transfer yourself to another Medicare card?

You can transfer to a new Medicare card if it is unsafe to remain on a previous card.

To do this, call Medicare on **132 011** and tell us what you want to do in English. We will direct you to the next step.

## 9. Do you have secure access to a bank account in your own name?

As part of your safety planning, you may have secure access to a bank account in your name only.

If you would like us to send your payments to that account, you will need to change your bank account details. Remember, you will need to do this separately for Centrelink, Medicare and Child Support.

## 10. Do you need help to understand our information?

If you need help to understand information about our payments and services, there are options available. For example, we can help if:

- you have a hearing or speech impairment
- you need to talk to someone in your language
- you or someone in your care have a disability, illness or injury.

To speak to us in your language, call:

- **131 202** about Centrelink payments and services
- the Translating and Interpreting Service (TIS National) on **131 450** about Medicare or Child Support payments and services.

Go to **servicesaustralia.gov.au/accessibility** for more information in English.

You can also find information in your language at **servicesaustralia.gov.au/yourlanguage**

## 11. Do you have a current child support case or need to apply for child support for your Family Tax Benefit?

Call Child Support on **131 272** for information in English if you are concerned about:

- seeking child support from your ex-partner
- us contacting your ex-partner.

## 12. Is there other business you need to talk to us about?

You can talk to us if you have questions about:

- Centrelink payments or debt
- Medicare payments or processes
- Child Support assessments or debt
- the security of your Child Support, Centrelink or Medicare records.

Go to **servicesaustralia.gov.au/contactus** for more information in English.

## 13. Where can I find other support services and tools?

Our social workers provide free, confidential counselling. They can refer you to other services that might help. Call our Employment Services line on **132 850** and ask to speak to a social worker. Let us know if you need an interpreter. We will arrange one for free.

There are other organisations to help you. You can find a list in English at **servicesaustralia.gov.au/domesticviolence**

**1800RESPECT (1800 737 732)** has a 24 hour, 7 day a week helpline and ‘Find services in your area’ function.

Ask Izzy is a directory to help you find services in your area. Go to **askizzy.org.au**